**Departmana Tendurustiyê**
**Xizmetên Tibbî ji bo Zarok û Ciwanan**

Neumarkt 15-21, 50667 Köln

Telefon: 0221/221-24786, Telefax 0221/221-24036
E-Mail: kinderundjugendgesundheit@stadt-koeln.de
Internet: www.stadt-koeln.de

## ji bo muayeneya destpêka dibistanê û şêwirmendiyê Vexwendin

______________________________

Nav, Paşnav û Roja Jidayikbûna Zarok

**Cîh:** ☐ Li Departmana Tendurustiyê, Ode

☐ Li Dibistanê

______________________________

(Mora Dibistanê)

**Kengê:** ______________________

Rojên nav hefteyê

______________________________

Roj Saet

## Ji kerema xwe re van tiştan bi xwe re bînin!



- **Pirsnameya pêvekirî**
- **Nameyên doktoran**
- **Raporên ji**
  **SPZ**
  **Navenda Destwerdana Destpêkê**
  **Terapiya axaftinê**
  **Terapiya Kar...**

Dê û Bavên Hêja,

Pêngaveke nû ya jiyanê, dest pê dike, zarokê we dest bi dibistanê dike. Ji bo muayeneya destpêkirina dibistanê û şêwirmendiyê ku ji aliyê tîma tibbî ya dibistana we tê lidarxistin, em dixwazin alîkariya we û zarokê we bikin, da ku rojên dibistanê baştir bêne birêveberbirin.

Ev muayene û şêwirmendîya ku ji aliyê doktorê dibistanê tê lidarxistin, ji muayeneyên tedbîrî ku hûn ji departmana nexweşiya zarokan dizanin, cuda ye. Ev ne muayeneyeke giştî ye, lê muayeneyek e ku armanca wê temînkirina pêvajoyeke baş e ji bo desptêkirina zarokê we ji bo dibistanê. Li gor vê yekê, bal li ser aliyên girîng yên jiyana rojane li dibistanê, wek guhdarî, dîtin, dirêjiya qamê, jêhatiyên masûlkan, pêşveçûna ziman, baldayîn, têgihîştin û mezinbûna bi temen re, tê kişandin.

Teşxîs û şîroveyên doktorê dibistanê wê bi we û bi rêveberiya dibistanê re bê parvekirin. **Biryara derbarê qebûlkirina zarokê we, wê ji aliyê rêveberiya dibistanê bê dayîn.**

Bi temînkirina randevûyê, em hewl didin ku wextê libendêmayînê ji bo we, bi qasî ku mumkun e, kurt bikin. Ji kerema xwe re, ji bo vê muayeneya girîng herî kêm 60 deqîqeyên xwe cihê bikin. Eger beriya destpêkirina dibistanê hûn ji tendurustiya zarokê xwe gumandar bin, bi wan re biaxivin. Ger pirsên we yên ku divê li ba zarok neyên nîqaşkirin, hebin, ji kerema xwe re ji me re bêjin. Eger pirsên we yên taybet hebin, em ê bi kêfxweşî randevûyek din ji bo şêwirmendiyê bidin we.

Ji bo gihîştina fikrek giştî derbarê rewşa tendurustiya hemû zarokên ku li dibistanê têne qeydkirin, netîceyên bidestxistî û tedbîrên ku têne şîretkirin, bêyî aşkerekirina zanyariyên şexsî, bi şeklekî anonîm ji navendê têne nirxandin. Em bi vê yekê re, ji we rica dikin ku hûn anketa li jêr bi temamî tije bikin.

Ji bo nîşandana cudahîya şeklên malbatan, me ji şûna navên "Dê", "Bav" navên notral, wek "Dê û Bav 1", "Dê û Bav 2", bi kurtasî ET hilbijart. Me cinsîyeta wan jî wek mêr, jin, wekî din li ber wan nivîsand. Em ji we rica dikin ku hûn li gor malbata xwe wan bibijêrin û di anketê de wisa bi kar bînin. **Zanyariyên hûn didin bi dilxwazî ye, bi dizî ye û tabi’e nepenîya tibbî ye.**

Ji kerema xwe re, **anketa tijekirî**, **deftera muayeneyê ya zer, nasnameya aşîyê**, eger hebin **raporên tibbî,** daneyên **navenda pedîatrîya civakî** (**SPZ)**, her wiha daneyên **navenda mudaxaleya lezgîn, terapîya axaftinê**, **ergoterapî** û hwd bi xwe re bînin.

Em ji we rica dikin ku hûn rewşa aşîyên zarokên xwe bi pedîatrîstekî/ê kontrol bikin û eger hewce be temam bikin.

Dibe ku xwûşk û birayên biçûk rahetiya muayeneyê xerab bikin û bibin sebebê nerehetîyê. Lewra em ji we rica dikin, eger mumkun be, xwûşk û birayên biçûk, bêyî kesî ku bi wan re mijûl bibe, bi xwe re neyînin.

Ji bo cehda we em ji aniha ve spasiya we dikin. Em ji we re û ji zarokê we re, di vê pêngava jiyanê ya nû de dilşadî û serkeftinê dixwazin.

Bi silavên germ

Li ser navê

Tîma Doktorên Dibistana we ya Departmana Tendurustîyê ya Kolnê

**Ji bo zarok an jî dê û bavên ku nikarin bimeşin:**
Ger hûn, wek dê û bavên ku refaqeta zarok dikin an jî zarok bi xwe, ji bo têketina odeya muayenê hewcedarê alîkariyê bin, ji kerema xwe re bi rêya telefon, e-mail an jî faxê min xeberdar bikin, da ku wextekî baş û odeyek munasib ji bo muayenê bê amadekirin.

**Ji bo zarok an jî dê û bavên ku nabihîzin:**
Ger hûn, wek dê û bavên ku refaqeta zarok dikin an jî zarok bi xwe, hewcedarê tercumanê zimanê îşaretê bin, ji kerema xwe re bi rêya telefon, e-mail an jî faxê min xeberdar bikin, da ku muayene ji bo wextekî ku tercumanê zimanê îşaretê amade be de, bê eyarkirin.

**Hemû zanyarî bi dilxwazî têne dayîn û wê bi dizî bêne nirxandin**

Forma qeydên tibbî ji bo muayeneyên li ba doktorê zarokan û ciwanan

01 **Malbat ji kengê ve li Almanya dijî?**

01.1 - **Zarok:** Ji dayikbûnê □ Ji sala __ __ __ __

01.2 - **ET 1: mêr □ jin □ wekî din □** Ji dayikbûnê □ Ji sala __ __ __ __

01.3 - **ET 2: mêr □ jin □ wekî din □** Ji dayikbûnê □ Ji sala __ __ __ __

02 **Di sê salên ewil de li malê bi zarok re bi çi zimanî hat axaftin? (Zimanê zikmakî)?**

Almanî □ Zimanekî din □ Kîjan? _________________

03 **Wekî din di nav malbatê de bi kîjan zimanan tê axaftin?**

__________________________________________

04 **Zarokê we ji kengê ve diçe mala zarokan (Kindergarten)? _ _ . _ _ . 201 _** hîç neçûye □

**(Roj | Meh | Sal)**

Kuçe û nimareya mala zarokan (KiTa): ____________________________________________

05 **Zarokê we di 18 mehîya xwe de dikaribû bi rahetî bimeşe?** erê □ na □

06 **Zarokê we di 2 salîya xwe de dikaribû 50 peyvan bêje?** erê □ na □

07 **Zarokê we di nava rojê de zuha ye (xwe şil dike)?** erê □ na □

08 **Zarokê we bi şev zuha ye (xwe şil dike)?** erê □ na □

09 **Di mezinbûna zarokê we de tiştek taybet heye?**

09.1 - **Nexweşiya xewê** erê □ na □

09.2 - **Qeza** (tenê qezayên ku gelek caran çêdibin an jî yên giran ) erê □ na □

09.3 - **Nexweşîyên kronîk** (Mesela Alerjî, Astîm, Epilepsî, Nexweşîya şekir ) erê □ na □

Wenn ja, welche? ________________________________________________________

09.4 - **Zarokê/a we dermanan bi kar tîne?** erê □ na □

Eger erê be, kîjan? ________________________________________________________

10 **<u>Nirxandina we ya şexsî</u> çawa ye? Zarokê/a min.**

10.1 - **dikare demeke dirêj bala xwe bide tiştan.** erê □ na □

10.2 - **li gor temenê xwe dikare xeber bide.** erê □ na □

10.3 - **li gor temenê xwe dikare xêz û boyax bike.** erê □ na □

10.4 - **bi zarokên din re xweş li hev dike.** erê □ na □

10.5 - **li gor temenê xwe pir bi hereket e** erê □ na □

10.6 - **tirsa wî/wê li gor temenê wî/wê zêde ye.** erê □ na □

11 **Zarokê/a we**

Pirr zeîf e? ☐ giranîya wî/wê normal e? ☐ pirr bi kîlo ye? ☐

12 **Zarokê/a min bi nîzamî diçe kûlubek sporê/kûluba avjêniyê.** erê ☐ na ☐

13 **Zarokê/a min**

13.1 - **di odeya wî de ev cîhazên jêr hene:**

Ne yek ji wan ☐ Televîzyon ☐ Komputer ☐ Konsolê lîstikê (Playstation/X-Box/Wii) ☐

13.2 **- <u>Rojane</u> televîzyonê temaşe dike an jî lîstikên kompûterê, telefonê, tabletê an jî yên konsolan dilîze,** (Ji kerema xwe re dawiya hefteyê jî bihesibînin)

insgesamt ________ Minuten pro Tag.

14 **Tedbîrên berîya niha ji bo zarokên we hatine dayîn**

(Teşxîs/Şêwirmendî/Terapî): erê ☐ na ☐

14.1 - **Eger hebe, li jêr xaç bikin:**

Desteka ziman li mala zarokan ☐ Navenda desteka zarokatîyê ☐ SPZ ☐

Ergoterapî ☐ Terapîya ziman ☐ Terapîya fîzikî/Terapîya hereketan ☐

Şêwirmendiya derûnî/Terapî ☐ Şêwirmendiya malbatê ☐

Yên din ☐ Kîjan? ________________________________

15 **Xwûşk û birayên bi hev re dijîn:** (tenê sala ji dayikbûnê) Kesek tune ☐

**1.** __ __ __ __ **2.** __ __ __ __ **3.** __ __ __ __ **4.** __ __ __ __

**5.** __ __ __ __ **6.** __ __ __ __ **7.** __ __ __ __ **8.** __ __ __ __

16 **Detayên taybet derbarê wekaleta zarok de** (Mesela, qedexeya têkilîya yek ji dê û bav, veşartina zarok, û hwd)

____________________________________________________________

16.1 **Kesê desteka malbata me dike:**

Wekîl ☐ Destekkarê malbatê ☐ malbata me nayê destekkirin ☐

17 **Kesê/n anketê tije kirin:** (Ji kerema xwe re tenê xaçekê lêxin)

Dê û bav bi hev re ☐ ET 1 ☐ ET 2 ☐ Dapîr / Bapîr ☐

Kesekî din ji malbatê ☐ Pflege-/Adoptiveltern ☐ Betreuer ☐

18 **<u>Hûn</u> dixwazin bi doktor re li ser çi biaxivin?**